Kurdî-kurmancî / Kurdisch Kurmandschi

**Hîndekariya bi zimanê Welt**

**(ziman û çanda welêt)**

**Heimatliche Sprache und Kultur HSK**

## Ji erkdarên hîndekariyê û malbatan re agahî

Destekdana zimanê almanî, pêşdebirina pirzimanîbûn û têrêkirina navbera çandan, di nava xebatên bingehîn ên hîndekariya li dibistanên fermî de cih digrin. Pêşdebirina pirzimanîbûn û têrêkirina navbera çandan bê guman armanca hîndekariya zimanê welêt e jî (HSK). Bi vê sedemê ev yek, li dibistanên fermî tê dayîn û ji aliyê berpirsyarên hîndekariyê yên kantonê ve tên destekdan.

## Pirzimanîbûn û têrêkirina navbera çandan

Ciwanên ku xwediyê asteke baş a zimanê hevbeş-almanî ne û dikarin bi awayekî herikok bi zimanê dê û bavê xwe bidin û bistînin, di warê integrasyona pîşeyî û civakî de jî, dibin xwediyê jêhatiniyên grîng.
Hîndekariya HSKê li hemû kantonan heye; li hinek bajaran bi zêdeyî 25 zimanên cuda, xizmet tê dayîn.

## Armanca hîndekariya HSKê

*Zarok û ciwan*

– Têrêkirina axavtin û têgihiştinê ya di xwendin û nivîsandina zimanê xwe yê yekemîn de kûrtir dikin û pêş de dibin.
– Jêhatiniyên xwe, ji bo bidestxistina dudu yan pirtir ziman û çandên cuda û têgihiştin û rêzgirtina ji nirx û pîvanên din re, pêşdetir dibin.

## Fêdeyên di nava civakê û jiyana pîşeyî de

– Kî bi zimanê xwe yê yekemîn baş zanibe, ji bo bidestxistina zimanên din ( almanî û zimanên biyanî) jî dibe xwediyê bingehekî çê.
– Asta baş a di zimanê yekemîn de, ji bo xurtkirina danûsitendina bi malbatê re û bi xizm û welêt re, alîkariyê dide zarokan.
– Ji bo têkiliya bi welêt re, asteke baş a têrêkirina zimanê welêt grîng e (perwerdeya piştre, kar û barên pîşeyî, vegera paş de)

## Bi vî awayî malbat destekê didin pêşdebirina zimanê zarokên xwe:

– Bi zarokên xwe re bi zimanê xwe yê hûn pê dihizirin û xewnan dibînin biaxivin; ger zarokên we bersiva we bi almanî jî bidin, hûn dîsa bi zimanê xwe bidomînin.
– Ji bo kêfa zarokên xwe li zimanê xwe bînin û destekê bidin wan, ji wan re ji jiyana rojane vebêjin, guh bidin ser wan, bi wan re gengeşe bikin, bistirên, ji wan re çîrokan vebêjin û bixwînin.
– Ji bo her endamê malbatê karibin bi zarokên xwe re rasterast têkiliyê deynin, bila her dem bi zimanê xwe bipeyivin.
– Ji bo zarokên we, bi zarokên almanî yan zimanên din ên biyanî diaxivin re karibin bidin û bistînin, destekê bidin wan û kêfa wan lê bînin.
– Destûrê bidin zarokên xwe ku tişta di dersên HSKê û dibistanê de hîn bûne, ji we re vebêjin.
– Bi parastina têkiliyên bi mamosteyên hîndekariya HSKê û mamosteyên dibistanê re, destekê bidin zarokên xwe.

## Sazî

Hîndekariya HSKê yan ji aliyê balyozxaneyên welatê jê hatine, yan jî ji aliyê saziyên taybetî ve tê pêşkêşkirin. Hîndekarî li gorî komên zimên ji hêlîna zarokan heta dibistana asta pêşîn refa 1. û 2. tê dayîn. Serlêdan di ser dibistanên fermî re tê kirin. Hîndekariya HSKê li dibistanên fermî –ger derfet hebe li nêzî niştewarê zarokan- tê bicihanîn. Hîndekariya HSKê li gorî plansaziya demên dibistanên fermî tê meşandin (betlane, dayîna bawernameyan).
Nirxandina jêhatiniya zarokan di bawername ango pelika hînbûna dibistanê de, tê bicihkirin.

## Navnîşana têkiliya kantonî

Erziehungsdirektion des Kantons Bern

Annette Brunner Bükim
Beauftragte für interkulturelle Bildung
Sulgeneckstrasse 70, 3005 Bern
Tel. 031 633 83 31
E-Mail: annette.brunner@erz.be.ch
www.erz.be.ch/hsk

Bern, Oktober 2008

Erarbeitet von den Erziehungsdepartementen und Bildungsdirektionen der Kantone Basel-Stadt, Basel-Landschaft, Aargau, Bern, Solothurn und Fribourg, in Zusammenarbeit mit den Trägerschaften des Unterrichts in heimatlicher Sprache und Kultur.